

# Beyta dilî

(Dilo rabe)

## Feqiyê Teyran (\*)

Amadekirin bi tîpên nûjen: *Cankurd*

"Yek ji mezintirîn hozanvanên Kurdistanê Feqê Teyran e, û yek ji bihatirîn parçeyên hozanên wî **Beyta dilî** ye. Ev hozana ji 260 malikane, nivîskarekî kurd ê bi navê **Xelîl Muhemed Dihokî** ji zardevê birader (**Ehmed Tahêr Ebdillah**) wergirtiye, ku xelkê gundê **Guherzê** ye û jiyê wî dora 40 sala ye. Seyda **Ebdilreqîb Yusif** di nivîsara xwe da, (**Dîwana kurmançî**) li berperê 129ê ev parçeyê hozanê aniye ser zimên, lê diyare, ev hozan neketiye destêd wî. Cara yekemîn hozana [**Beyta dilî**] di kovara **Beyan** de jimare (?) hatiye belavkirin. Berî niha bi çend salan min ev parçe bo belavkirinê bi tîpên kurdî yên nûjen amade kiribû."

Dilo rabe dilo rabe,

Veke çava, ku êvar e,

Nezan û bes di xew da be,

Bi newmê (1) ra mebe yare..

Dil û şîrîn neke newmê,

Ji nefsa xwe bike lewmê,

Neçe nêzîka wê qewmê,

Dilo ew fîla (2) xesar e..

Dilo newmê me jê bese,

Beyana xefletê nehs e,

Nehîşyarî gelek tehs e,

Li min ew xaba mirdare..

Dilo rabe li vê xabê,

Weku bapîr, weku babê (3),

Lazim dê çîne tu rabê,

Li bal bax û weferwar e..

Binêr bax û weferwarî,

Binêr çerxê û rojgarî,

Li te roj hate êvarî,

Te ne e'qlew (4) ne hişyar e..

Eger e'qlî were cengî,

Bi nefsa xwe heta kengî,

Tu xafilî bi vî rengî,

Ey ya kehro ley guhdar e..

Çi wey sistî, çi wey kehlî,

Dixu bêk û dixu mehlî,  
Nebe xerkoş di nav deh'î,  
Siyadê (5) te kevandar e..  
Siyad dibêt te ranakem,  
Me bêj nabêt, me bêj nakem,  
Mecale dê bi xew xakem,  
Binêr carek çî hawar e..  
Binêr carek çî bangîne,  
Ji newmê xwe vehiş (6) bîne,  
Dinê qetl e û dinê xûn e,  
Dinê gerdûn (7) û rizgar e..  
Dibarîtin di gerdûnê,  
Li xwe rabe demek rûnê,  
Tu natirsî li heytûnê (8),  
Li bin te agir û nar e..  
  
Li nav narê evê pêtê,  
Li ser sêlê xewa kê tê,  
Ecel gurg e (9) yeqîn kê tê  
Te ne fikre û ne ew kar e..  
Tu wan fikra çî ranakey,  
Tu xwe ji xewê cuda nakey,  
Dê êvarî çî peyda key,  
Ey ya meymestê (10) xemmar e..  
Xewa qelbî e'mel bê cih,  
Guhê xelkî kehr û bê bih,  
Mecd xwe berda ser balgih,  
Xewa bê cih qewî âre (11)..  
Xewa bê cih qewî pos e,  
Me ne nav e û ne namûs e,  
Dikana Xaçe ya rûs e,  
Dibên Xaçe yê qerdar e..  
Dibên Xaçe yê bê debr e,  
Di meenê da dikan qebr e,  
Tijî toz û tijî xebr e,  
Sepet reng e tijî mar e..  
Tijî mar û tijî mor e,  
Qew (qebr!) ya teng e, gelek kûr e,  
Xwe ji qebrê nekin dûr e,

Li wê mal e, li hêre war e..  
Bûye payîz li van wara,  
Xezal weryane bin dara,  
Li bin çî diken gelî yara,  
Li mêrgan bûye xîsar e..  
Xezal zerbûn ji sermayê,  
Rabûn rewneq ji dinyayê,  
Li boşavan guşîn (12) nayê,  
Ne ew man û ne enhar e..  
Buhar borî û av kêmbûn,  
Hizar bexçe li ber dêm bûn,  
Payîz dahat û gul kêmbûn,  
Weşandin belkê minxar e..  
Ne berçem man, ne sosin man,  
Ne gul man û ne rîhan man,  
Ne lalayêt sibah (siyah) (13) xal man,  
Tenê min h'eyf ji wan xar e..  
Tenê min h'eyf ji wan tiştê,  
Li beybûna li bamiştê,  
Xwezî ew reng heban hêştê,  
Li êlçiyêt nîstîn (14) dar e..  
Ne çiçek man, ne zeytîn man,  
Ne âbidêt di xweşxûn man,  
Ne zozanêt di rengîn man,  
Ne Nîsan û ne Adar e..  
Xweşî borî li Nîsanê,  
Heyamê van mihan kanê,  
Bûye Îlon li zozanê,  
Ne kanî man, ne cobar e..  
Ji cobara geya kehr çûn,  
Ji lutfê xwe bi dilber çûn,  
Wekî bayê kelem ber çûn,  
Dilo! ya bêdî dijwar e..  
Li min bayî kire gazî,  
Xezal pêçane efrazî,  
Madem aşê li wî sazî,  
Weşandin sunbilan ar e..  
Dibarît ar ji esmana,

Zemanê çerx û dewrana,  
Gerê (15) avête rîhana,  
Ne bixûr û ne bulxar e..  
Li bulxara di reng dayê,  
Di mexmorî di pêçayê,  
Qumaşkevne bi kêr nayê,  
Ruyê hîma yê e'ybdar e..  
Rûyê hîma bî çil salî,  
Di nav qebrî û reşkalî,  
Reqîq barî li ber talî,  
Hemî têk bûne cobar e..  
Li min pertal ketne avê,  
Kefa behrê giha navê,  
Siya mexmor li ber tavê,  
Sipî bûn reng û rûbar e..  
Sipî nûr û hîdayate,  
Reşî renga bi zulmate,  
Yeqîn ev çû ew roj hate,  
Xwedê xessalê qehhar e..  
Xessalî têrkirin şîştin,  
Li ber tavê gelek miştin,  
Ji rengê pîriyê riştin,  
Şukirdarin bo cebbar e..  
Şukirxazîn bi vî h'alî,  
Hewa ê lew libas lalî,  
Weşandin belgêt helalî,  
Ne min reng man, ne roxsar e..  
Ne me reng ma, ne rah'et ma,  
Ne me xew ma, ne qiwwet ma,  
Ne me çar ma, ne taqet ma,  
Hemî jê çûn dinê sar e..  
Dinê mehd e û mehlok e,  
Weku lu'b e û leyzok e,  
Çi dizanin tîfl û zarok e,  
Felek çerx e û xeddar e..  
Bê qerar e ya şîrîn e,  
Weku şekir û hingivîn e,  
Di nav êk da ya şîrîn e,

Ya dav doz e ya mekkar e..  
Dinê qenc e ji şêran ra,  
E'cîb mulk e ji mêran ra,  
Ku avakin ji xêran ra,  
E'cîb mezra û e'ffare..  
Dinê qenc e tijî şêr bin,  
Di xêran ra di xweşmêr bin,  
Ne şubhê min di bê xêr bin,  
Di bê kesp û bê kar e..  
Ey ya bê kespê bê xêr e,  
Eger e'qlê te teksîr e,  
Tu ya can nede bi ya pîr e,  
Desta jê berdin ya sar e..  
Gulo (16) ya pîr bi kêr nay e,  
Lew ya qenc e, ku mezra ye,  
Ji xêran ra Xwedê daye,  
Xebatê biken, ku êvar e..  
Du car naye di dinyayê,  
Cewaba xweşhero nayê,  
Bigre qotê xwe ji vê zayê,  
Niho ev qotê bê çar e..  
Tu qutê xwe niho çarke,  
Zewadê axretê karke,  
Bilezîne û dê barke,  
Dinê ew sîk û bazar e..  
Ne Adem ma, û ne Sîs ma,  
Ne Nûh ma û ne Idrîs ma,  
Ne Yûnis ma, ne Cergîs ma,  
Ne Eyyûbê birîndar e..  
Ne Yeh'ya ma, Ne Salih ma,  
Ne Haron ma, Ne Mûsa ma,  
Ne Meryem ma, ku Isa ma,  
Ne Ehmed ma, ne çar yar e..  
Ne Eflaton û Luqman man,  
Ne Dawod û Suleyman man,  
Ne Fîrewn û Ne Haman man,  
Ne xîndkarêt li ser kar e..  
Ne Calînos, ne Qeret man,

Ne Tatalêt, Seqret man,  
Ne Zulqerneyn û Mureet man,  
Ne Cemaçîn û Eqyar e..  
Ne Cemîd ma, ne Cimcim ma,  
Ne Qeys ma û ne Hatem ma,  
Ne Asif ma, ne Xatem ma,  
Ne sultanêt di kubar e..  
Ne Talot û ne Calot man,  
Ne Harot û ne Marot man,  
Ne ewladêt di Yehqob man,  
Ewê pîrê Yûsif xar e..  
Dinê pîr e, dinê sîk e,  
Dinê pîr e û ne nû bîk e,  
Heçî mêmê ku pê şîk e,  
Kul û guh û niho xar e..  
Eya xelqê biyabanê,  
Xelqê me dît hemî kanê,  
Hemî çûne li wê xanê,  
Ne sultan man, ne xîndkar e..

Dinê sûka Ebo Cehl e,  
Li bal me a'miyan lehl e,  
Ji eqlê aqilan teh'l e,  
Li bal Isa ya mirdar e..  
Dinê pîr e, ku Isa dî,  
Bi şîklê wê nebî razî,  
Telaq dabû li nik qazî,  
Ser deynabû ser hefsar e..  
Bi wê sîndê ya min xarî,  
Eser nakem ser hefsarî,  
Tu ba pîsî ya feharî,  
Te ne şîkl e û ne dîndar e..  
Dixum sînd bi bab Adem,  
Bi Incîlê, bi kelam dadem,  
Édî meylê bi te nadem,  
Te ne Ehd e û ne qîrar e..  
Ruha Isay Xwedê kes kir,  
Dinê nasî û jê bes kir,

Muerref bû, bi wê hes kir,  
Li nav xelqê xwe vavar e (17)..  
Kesê ehd e, kesê merd e,  
Di ber ku hêj nebû mehd e,  
Heqe meylê jê xeberd e,  
Çi reng kehmekê qehhar e..  
Dinê tîn e, dinê xak e,  
Dinê mehd e, dinê mak e,  
Ve ewlada ebed nake,  
Ya bê rehm e, ya xemxar e..  
Dinê bê rehm û dil leng e,  
Beya mal e xarî leng e,  
Herro qal e, herro ceng e,  
Ya bê rehm û ya dijwar e..  
Ya bê rehm e, ya dilsoj e,  
Ji wan rengêt ya bê doj e,  
Bi van hala kul û goj e,  
Bela wa têt heyê har e..  
Herro barken, herro çon e,  
Li bal me hilgirtin kon e,  
Di nav qebra dê ajone,  
Weku xirşêt heyê har e..  
Di xorşîd û dî axê da,  
Herro carek binêr têda,  
Ku di razayne di axê da,  
Hemû xamoşêt bê çar e..  
Hemû xamoş di razayne,  
Bi van fikra ve veşarin,  
Bi van fikra feqê jarin,  
Dibê tewb e û îstîxfar e..  
Herro sed car biken tewbe,  
Dereng e û hêj nebû newm e,  
Dil hişyar bûn dibê xew be,  
Ne hevrî (hevrê!) man, ne hevvar e..

Em hemî pê pê hevala,  
Dê lazim çîne wan mala,  
Demek razeyne wan çala,  
Dê li ser me bît xubar e..

Em dê çûn, ewlad dê mînin,  
(Mîm û Hey) bîra xwe bînin,  
Fatiyan (18) ji me ra bixûnin,  
Hewceyên der întîzare..

(Mîm û Hey) (19) heftê felek çûn,  
Ji Hicretê dewran gelek çûn,  
Sal hizar û çil û yek çûn,  
Ev xezel anî diyare..

---

(\*) [ **Feqê Teyran** ]

nivîsandina

( **Seyda Sadiq Behadîn** )

( Jêder: **Hozanvanê kurd - bi tîpên erebî** )

Hozanvanê jêhatî û desthel, sert û bi nav û deng li her çar kinarê Kurdistanê û layê bi rex ve di sedê panzdê heta anzdê ji bûna Isayî, evîndar û şeyda, meftûn û heyranê deng û awazê awazbêjê dilveker û xemrevînê dilkul û dil bi keser û kovan û xemgînan, zêdebar yê waz û tewal û tiloran, ji bilbil û şalûle û endelî û belakîtê beyaran, ji tivîrk û gasiran, ji zelûle û reşûlan, ji por û kewan, ji dengê bi sehm û tirsê dehbe û terşû hovan, ji pîrêna kelêt pezkûvî û mamiz û şivirkan, ji marêna mehan û barêna berx û karan, ji hoşe-hoşa ava şîve-kûran, ji hurme-hurma ava geliyan, ji vîje-vîja bayê bihorê dol û nihalan, kasotî û hinavsotî û cegerkuzriyê van hemî rûdanê siroştî, heval û hevgorê wan, ku ji ber hindê ye bi navkiriye û nav li ser danaye dibêjnê **Feqê Teyran**, ji ber ku heyranê dengê xweş û sazgar, dilgîr û şeydayê dîmen û dîndarê war û zom û serê sipehî û rengînê Kurdistanê bû.

Ev hozanvane bêguman stêreka hindî bêjî- geşpir ruhn û roşen û ronahiye, wekî stêra gelvêjê ye di nav stêrê dî da di esmanê torê kurdî, di meha ruhna kewçerê da. Her wesa şahsiwar û nehengeke ji kengen an afretûnê torê kevnê kurdî yê, ku hinde zana û torvan bi navê torê klasîkî didene qelemî. Ço hozanvanê kevin wekî vî hozanvanî bi navê dûrî navê wî yê rast bi nav nekiriye. Ji rêve, berî bi navê **Feqê Teyran** bête navkirin an ku li ser danan, bi navê **Feqê Gerok** navdar buye, çunkî her wekî tête gotin wekî feqê dî yê çax û demê xwe nebuye, ku heyamekê xweş ji salekê pêtir yan jî kêmtir bêje xwe nêzîkî şeşmeha jî li direkê ya li cihekî akincî nebuye, belê ji wan buye her wekî bi serhatî dibêjin: li ço dera yan ciha koçkê xwe reşnekirine, an ku ço wê wesa lê nemaye û jiye, her heyamekî kê mî heta çar heyva maye lêdaye çûye cihekê dî, ji ber vê yekê bi navê **Feqê Gerok** bi nav kiriye. Belê **Feqê Teyran** jî ne navê rastê hozanvanê em li ser di axivîne, belê **Feqê Teyran** nîana wî ye, ku pê hatiye niyasîn. Ev pirsiyare di cihê xwe da ye bête kirin: Gelo bo çî bi nîana **Feqê Teyran** hatiye nîşankirinê, ku cihê ya ûna navê wî û navê babê wî jî girtiye ? di bersiva vê pirsê da, ço tiştê rast û ruhn heta niho vê gavê nîne, ku bawerî pê bête kirin û ço guman têda nebit. Li ser vê çendê tiştê hey çêrokê bi zar tene gotin û çivanokin, ku renga gelek jê nêzîkî rastiyê bin yan jî çivanokê çêkirî bin, bo berêk ve înan bersiva wê pirsiyarî ne. Ji çîrokê tene gotin, ku bi guh min ketî ev herdu çîrokene ji zar devê seydayê dilsoj û xebatker

**Muhemmed Dewranî** min nivîsiye, herdu jî bi mîrê **Cizîra Bota** ve bestî ne, ku wî an ku miirê **Cizîra Bota** ew nav li ser Feqey danaye, gotiye **Feqê Teyran**:-

**Çîroka yekê (êkê) bi vî rengî ye:-**

Rojekê ji rojan **Feqê** û hogîrekê (Hevgorekê) xwe ji çiyay dihatine **Cizîra Bota**, di şergeh û kelekela havînê dabû. Li nêzîkî sere rêyeka nêzîkî **Cizîrê** dareka bi qewena mezin lê bû digotê : " **Dara maziya reş**". Li bin darê kaniyeka mezin lê diza, çu aşek ji ber diçû. Ava wê kaniyê bi zelalî û xweî û sivkî û sariya xwe li wê warî û wê deverê hemiyê deng vedabû. **Feqe** an ku **Feqê Teyran**, bi hevalê xwe ve yê navê wî "**Simo**", reya bin darê û ser kaniyê girt da ku li ser wê kaniya sipehî û rengîn, heyamekî bêhna xwe biden, heta ku tehere dişkê, bi wê ava tezî û zelal dest û çavêt xwe bi şûn û zuha biken, da ku bêhne ser hêz û vejena xwe, hêşt wan bêhne serî. Gava gehiştîne ser kaniya li bin darê, Simoyê hevalê Feqey, hindê têhn bû, hindî hate xwe neşiya xwe ragrît, dest û çavêt xwe bişût û hêdî hêdî avê bi lepa vexut, heta ku têhna wî dikê. Her di cih da gava çav bi avê ketî, xwe dev û dev havête ser rexê kaniyê û wekî terşê, ji têhna da û ji xweşî, sifkî û tazeya ava kaniyê teziya wê, hingî serê xwe bilindkir rabû ser xwe rûnişt heta xwe mendkirî wekî têşkewka betilî, neya ji cihê lê xwe bilvit ya bizvît. Îna xwe girêl kire ser mêrga bi rex kaniyê ve ya li bin dara maziya reş. Çavêt xwe noqandin da bêhna wî bêt. Feqey jî dest û çavêt xwe pakij şûştin û zuhakirin, heyamekî ma hizrê xwe di ava kaniyê da kirin, paşî tê av vexar û xwe kêl kire ser geyayê kesê mêrgê. Heyamekê xweşî herdu heval û hevgor mane dirêjkirî û nepetî bûn, paşî ji nişkekê ve Simo rabû ser xwe her wekî sehme bo çêbûy her hadir gazî Feqê hevalê xwe kir, gotî: **Bo çî ranabiye ser xwe ?!**

**Feqey** xwe kehr kir, her wekî gul çu nîne. Îna careka dî gazî kirevê. Belê vî carê jî guh bi xwe dadan xwe mit kir. **Simoyî** dil neda kotekiyê lêket raket çiku westiyayî û nivistiye, îna rabû ser xwe. **Feqe** yê hişyare hay jê heye, belê bi xwe neîna der. Gava rabû, tirsîya dengê dî ji xwe bînt, îna li ser xwe hêdî gote **Simoy** got: " **Rûne xwe bê deng ke, nabit dengê ji te bît.**" **Simo** ma hizrê xwe kirin, eve **Feqey** çiyê ?! Bo çî nahêlît deng ji min derkevît ?! Îna gotî: "**Erê ma çî qewimiye tu nahêlî ez lêvan li ser êk pelînim, dengê ji xwe bînim ?**" Feqey ji devî vegirt got: "**Dê tu bêhna xwe firehke, da ku guhê xwe bideyne van kevotkê - wazê - li ser vê darê dadayî ka dê çî bêjin ?**" **Simoyî** di dilê xwe da tirane bi gotinê **Feqey** kirin, bi dengê bilind di gel **Feqey** axivt. Her di cih da kevotkê li ser darê bi wan hesiyan, ku li bin darê rûnitîne, îna firîn çûn. **Feqê Teyran** rabû ser xwe rûnit û digel Simoyê hevalê xwe peyivî wan kevotka li ser dara maziye çî gotî, hemî ket kete ya êk li dû êkê kirine guhê Simoyî got: "**Ew kevotkê li ser darê firîn ew heyamekê xweş bû, digel êk dipeyivîn**". Digote êk: "**Ev mirovê li bin darê an ku ez û tu, evro bi rastî keyfa me têkda, ew çîliyê geyayê ter ê ji nû hildayn û bi ser kevî, yê bi wê ava sipehî û zelal avdayn û xunavê girtî em jê zirbeher kirîn. Ewê li bin darê ji rapêça wan diyare ew derwşin**". Kevotkeka dî got: "**Nexêr, ew ne derwêin, ew nêçîrvanin rêvîngin, ne xelkê Cizîrê ne, ji ber ku ji rapêça wan xweyaye, ku ne ji xwe cih û akinciyê vê deverî ne**". paşî got: "**Dê da zû biferîn û xwe ji lepê wan qortal keyn. Hêz çû dirb negehandîne me, ji ber ku bawerî bi mirovan, bi nifşê ademîzad û Hewayê bi çu rengan nabî bête kirin. Berî çendroja gelek mêr û xurt li vêre xirve bûn. Ev lenda hene kola û hinde tûr havêne têda, kevî an ku ferş û helan danane ser û ax kire ser, wêlê kir, ku kes nazanê wîre kolaye û tiştekirîye di bin ra ji Xwedê pêvetir**". Simoyê hevalê **Feqey** bû qeh qeha kaniya wî, tirane bi gotinê **Feqey** kirin gotê: "**Erê tu ji hemî dilê xwe we dibêjî?!**" **Feqey** gotê: "**Pa xwe ne ez bi tirane ve we dibêjim**". Paşî herduwa bêhna xwe dayî, rabûn rêka bajêrê **Cizîrê** girt çûn. gava gehitîne rex

bajêrî, çavê wan bi hindek xurtêt mîrê **Cizîrê** ket, li ser rê bûn zêrevaniya rêkê dikir, ka kî têt û kî diçît. Gava çavê wan bi **feqey** û hevgorê wî ketî, guman li nik peyda bû, ku ev du rêvîngene renga diz bin, ji ber hindê bezînê her çar rex lê girtin da nerevin û dest lê girêdan, dane ber singê xwe birin heta ku gehandîne ber koçka mîrê **Cizîrê**. demê **Feqe** û **Simo** bi jor kevtîn, çavê mîrî bi **Feqey** ket, **Feqe** niyasî - naskir -, ji ber hindê zêrevan verevandin û bi xêrhatineka germa **Feqey** kir gotê: "**Bi xêr hatî, fermû rûne da te tê** bigehînim çî li me qewimiye. Paşî berebeytek ji serî heta binî mîrî bo **Feqê Teyran** gotî, got: "**Bira Feqe, piştî tu çuyî kiryareka mezin li me qewimî, obeka diz û çetan kevtine xizîna me bi serê xwe dakir, ço têda nehêla xir û valakir. Em nizanîn kîne ? Şopa wan jî me nezaniye, ji ber hindê, çend bê jî em aloz û perîşanin. Serêt rêka li me berze bûne, em nuzanîn dê çî keyn.**" **Feqe** ma heyamekê xweşhizrêt xwe kirin, paşî serê xwe bilind kir, gurmijî û berê xwe da mîrî got: "**Mîrê min, ez gelek diz û çetan û rêgiran dinyasim (nasdikim), ji bilî hindê jî, ez ezmanê teyr û tivîra (teyr û waza) dizanim.**" Mîrî gotê: "**Feqe heke tu wan dizan ekeray key, ez û tu dê xezîne li xwe lêkvekeyn, nîvek bo te û nîvek bo min û ez dê navê te jî keme Feqê Teyran.**" **Feqey** gote mîrî: "**Destûriya min bide da ez biçim sehmeke, belkey ez cihê lê danay pê bihesêm!**" Mîrî destûriya wî da. **Feqe** rast rabû, hinde xurt û pisporêt mîrî digel xwe birin, êkser rêka wî cihî girt yê ku kevotkê li ser dara maziya reşpê axivtîn. Gava gehîştin, **Feqey** gotê bikolin. Paî kolay gehîştin ferêt bera ya helana rakirîn, dît ku lendeke kolayî, tûrêt mişt û tijî ji zêr û para û gewhera têdane. hemî ji korê îrane der û da qutan, çend xurt hinartin, ku bibez biçne **Cizîrê** mizgîniyê bidne mîrî. gava gehîştin û mizgîni dayê, mîr gelek pê şad û bextiyar bû. rabû giregire, maqûl û harîkarêt xwe digel xwe birin, çûne cihê xezîne lê veşartî. Hemî zêr û pare û gewher û mirarî bi birayîni wî û **Feqey** li xwe lêkvekirin û navî **Feqey**, **Feq Mihemedî** kire **Feqê Teyran**. Ji hingî were navê **Feqey** li dû nav lê nay mîrê **Cizîrê** li çar kinarêt **Kurdistanê** bû **Feqê Teyran**, çunkî zimanê teyr û wazan dizanî.

#### **Yan jî vê çîroka jêrî pêve dibêjin:**

Carekê ji cara, rojekê ji roja, mîrê **Cizîrê** digel hinde hevalan û hevgoran, çûn rav û nêçîran li ser şetê rûbar **Dicley** li nêzikî bajêrê **Diyarbekrê**. Demê, ku mîr bi heval û hevgorê xwe ve bindest û şîrkêşan ve li ser rûbarî bûn, rava masiya dikir, **Feqey** yê, ku bi navê gerok bi nav dikir, ji ber nehecimtina wî li cihekî, bo çî di ber rûbarî ra naborît. Mîrê **Cizîrê** yê, ku gelek hejê dikir, gava çav pêketî yê di ber rûbarî ra diçît, gazî kirê gotê: "**Were ev hevalene hêj bawernaken, ku tu zimanê teyra dizanî, ez jî hêj bi diristî bawer nakem.**" **Feqey** li ser darxaza mîrî bê dilî xwe rêka xwe guhart çû nik mîrî û silav kir. Mîrê silav jê wergirt gotê: "**Dê were tu bi xêr hatî. Dê rûne.**" **Feqe** rûnit. Heke tiştê danaye ber, dibêjin, bi rex rûbarî ve bilibilek dirkekê da bû, paşî xudanê wî jê dûrkevtî bo bi cihîna pêtiyêkê, bilbilê me dest bi awazê xweş û dilvekerê xwe kir, **Feqey** guhê lê girtî heyamekê xweş, mîrî jî haj **Feqe** ye, ku hizar wî li nik bilibilê dirkê da ye, ne li çivata mîrî ye. Mîrî gotê: "**Feqe ! te guhê li awazê bilbilî mût kirîn, tu nabêjiye min çî dibêjt?**" **Feqey** bersiva mîrî da, got: "**Bilbilê dirkê da li ser teraşê.**" got: "**Nexwezyê wê roja, ku ez di kona (qola) xwe da mayim û nêçîrvanî ez girtim û ez kirîme devê rikê da wekî girtiya. Ez ji van xweşî û şadiya bi carekê zirbehîr bûme. Heke ezê bi îqbal û şans bama, ez wê rojê ji dervey kona xwe bama, da ez jî niho yê serbest û azabim, wekî van bilbilê li vî çemî binîveka dilê xwe digerin, dileyzin û distrin, ne ku dirkeka bi host û nîva pan û bi host û nîva bilind da bim per û şeper li min bişkên heke min lotek li xwe da û nikil û ser û çavê min xwînelok bûn hindî bi çar kinarêt rikê dikevin.**" Ji ber hindê dibêjin mîrê **Cizîrê** bi navê **Feqê Teyran** bi nav kir (\*).

-----  
(\* Ev herdu çîrokêt navkirina **Feqeyî** bi navê **Feqê Teyran** min ji zardevê birader **Muhemed Dewranî** sala(1967)ê nivîsîne.

**Têbînî:**

- 01) Newmê (Erebî ye): Xewê
- 02) Fîl (Erebî ye): Pîşk, kar
- 03) Babê: Bavê
- 04) Eqlê (Erebî ye) : hişê
- 05) Siyadê (Erebî ye): Nêçîrvanê
- 06) Vehîşî: Hişyarî
- 07) Gerdon: teviya dinyayê
- 08) Heytûn: Dojeh û agirdana gewre
- 09) Gurg: Gur
- 10) Mey: Bade ( Ereq)
- 11) Âre (Erebî ye): Şerm e
- 12) Guşîn: Guşguşa avê
- 13) Sibah: Rastî siyahe (reş)
- 14) Nîstîn: Ji nû distînin
- 15) Gerê: Tozê
- 16) Gulo: Rastî Gelo ye
- 17) Vavare: Bijare ye
- 18) Fatiyan : Fatîheyan
- 19) Mîm û Hey: Navê Feqê Teyran e.